# PDK-Bakur
## DAXUYANIYA 61EMÎN SALVEGERA DAMEZRANDINÊ

TBi helkefta 61emîn Salvegera Damezrandina Partiya Demokrata Kurdistana Tirkiyeyê (PDKT), em wekî PDK-Bakur ya ku peyhatiya wê ya qanûnî, dîrokî û siyasî ye; kadroyên xwe yên damezrîner bi rêz û hurmet bibîr tînin û van prensîbên xwe yên sereke yên li jêr, careke din ji neteweya Kurd, gelê Kurdistanê û raya giştî re radigihînin.

Damezrandina PDKTyê ya di sala 1965an de, li Bakurê Kurdistanê, ji bo bi sazîkirina siyaseta hevdem ya Kurdistanî, pengaveke dîrokî ye. Seîd Elçî, Faîq Bûcak û hevdozên wan, pirsgirêka Kurdan ji çarçoveya mafên çandî û reformên îdarî derêxistin û arîşeyê wekî “Doza Kurdistanê” pênase kirin û hîmên xeta siyasî ya Kurdistanî ya ku wek rêbaz hebûna neteweyî ya Kurdan, welatê wan yê dîrokî û mafên neteweyî yên jêneger danîbûn ber xwe, avêtin.

PDK-Bakur peyhatiya vê xeta hiqûqî, dîrokî û siyasî ye û têkoşîna xwe li ser heman prensîbên bingehîn didomîne.

Yek ji referansa sereke ya ku bingeha îdeolojîk a partiya me pêk tîne, xeta siyasî ya Kurdistanî ye ya ku bi têkoşîn û paşxaneya Mela Mistefa Barzanîyê nemir şênber bûye. Ev xeta ku têkoşîna dij-kolonyalîst û demokratîk temsîl dike, çar paçeyên Kurdistanê wekî yek welatê dîrokî, neteweya Kurd jî wekî yek neteweyî qebûl dike û mafên neteweyî di ser hemû hisabên siyasî û demkî re digire.

PDK-Bakur vê xetê ne bi tenê wek mîrateke dîrokî, berevajî vê wek referanseke sereke a siyasî ya ku îro ro jî rêya me ronî dike, dipejirîne.

Partiya me, pirsgirêka Kurdistanê beriya her tiştî wek pirsgirêkeke desthilatdariya neteweyî dinirxîne. Mafê çarenûsê ya neteweya Kurd a ku pêşeroja xwe bi îradeya xwe ya azad diyar bike, encameke bivênevê ya mafên wê yên xwezayî û jêneger in ku ji netewebûnê pêk tên. Ji ber vê yekê, mafê çarenûsê ji hêla PDK-Bakurê ve ne daxwazeke siyasî ya bernîqaş e, mafekî netewî û jêneger yê neteweya Kurd e.

Tu desthilatiyeke siyasî, tu sazûmaneke makeqanûnî û tu geşedaneke navneteweyî ne cihdêrka vî mafî ne. Bi heman awayî, tu partî, tu rêxistin û tu kesayetiyeke siyasî jî mafê xwe nîne ku li ser vî mafî biryarê bide yan wê bike mijara danûstandinê. Lewre, mafên neteweyî milkê nifşekî, partiyekê an kesekî nîn in. Ew mafên hevpar yên tevahiya neteweya Kurd in û nayin veguheztin.

Partiya me, îdeala Kurdistaneke serbixwe û yekgirtî wek armanca dîrokî ya neteweya Kurd qebûl dike. Digel vê yekê, partiya me daw û doza xwe li Bakurê Kurdistanê bi rê ve dibe û têkoşîna rewa û demokratîk diparêze ya ku pax bi şert û mercên xweserî xwe yên her parçeyê dike.

Ev nêzîktêdayîn xwe dispêre helwêsta me ya ku baweriyê pê tîne ku di navbera pers-

pektîfa me ya dîrokî ya derheq yekbûna Kurdistanê û rastiyên siyasî yên îroyîn de hevgirtineke stratejîk heye.

Neteweperweriya ku PDK-Bakur diparêze, xwe naspêre tu angaşteke serdestia ya nijadî. Bingeha neteweperweriya me, welatê me yê dîrokî Kurdistan e. Ji ber vê yekê partiya me, helwêsteke piranîparêz, demokratîk, neteweperweriyeke dij-kolonyalîst û terîtoryal (axparêz) e diparêze.

Ev helwêst, helwêsteke neteweperwerane ye, ya ku erdnîgara dîrokî ya Kurdistanê wek bingeh digire, hemû rûniştivanên rewa yên welêt, wek regezên wekhev yên pêşeroja me ya hevpar qebûl dike, serdestiya neteweyî li ser helwêsta niştimana hevpar ava dike û xwe dispêre demokrasî û niştimanperweriyê.

Ev nêzîktêdayîn, tu gelî li derveyî xwe nahêle; serdestiyê ji bo tu civaka nijadî yan dînî re jî rewa nabîne, berevajî vê, ev neteweperwerî, neteweperweriyeke hemûkî ye ya ku yekîtiya dîrokî û siyasî ya Kurdistanê bingeh digire û hemû gelên meşrû yên Kurdistanê wek pêkhateyên hevpar dibîne.

Li gorî PDK-Bakur, mêtingerî ne bi tenê windakirina serdestiya siyasî ye. Binaxeyên xwezayî yên welatekî yên ku derveyî îradeya wan têne bikaranîn; geşedanên aborî yên ku li gor pêdiviyên mêtingeran tên dirûvandin, midaxalekirina binyada rêjeyê, ziman, çand û hişûbîra wî yê dîrokî yê bi polîtîkayên bişaftinê yên sîstematîk dûçar tên hiştin, xelekên jêneger yên heman pergala mêtingeriyê ne.

Partiya me, polîtîkayên asîmîlasyonê yên ku bi awayekî birêkûpêk ziman, çand û nasnameya dîrokî ya neteweya Kurd ji xwe re kirine armanc, wek beşek ji kir û kiryarên mêtingeriyê yên ku ji bo tunekirina hebûna me ya neteweyî tên bi rêve birin, dinirxîne. Bi heman awayî, dewlemendiyên xwezayî û derfetmendiyên aborî yên Kurdistanê yên ku bêyî îradeya gelê me tên bikaranîn, rewşa aborî ya ku ji şêlandina desthilatdariya neteweyî pêk tê, nîşanî me dide.

Ji ber vê yekê PDK-Bakur, ne bi tenê wek mijareke statûya siyasî li azadiya Kurdistanê dinihêre, berevajî vê, wek qonaxeke azadiyê ya berfireh dinirxîne ya ku ji parastina hebûna çandî, mafê teserûfa netewî ya li ser binaxeyên aborî û ji hemû derfetên welêt yên ku divê li gor îradeya gel a azad bên bi rêvebirin, pêk tên.

PDK-Bakur pê bawer e ku têkoşîna ku li her çar parçeyên Kurdistanê tê birêvebirin ji hev ne cuda ne, ew rûdanên cihê yên enînivîsa me ya dîrokî ya hevpar in. Xwedîlêderketin û bipêşxistina destkeftinên neteweyî, yên ku li başûrê Kurdistanê di encama berdêleke mezin de hatine dayîn, berpirsiyariya hevpar a hemû neteweya Kurd e. Bi heman awayî, xwedîlêderketina destkeftinên rewa yên gelê me yê li Rojavayê bi dest xistine û têkoşîna azadiyê ya ku li rojhilatê Kurdistanê tê birêvebirin jî, xelekeka jêneger ya berpirsiyariya me ya hevpar e.

PDK-Bakur, hemû bizav û dam û dezgehên siyasî yên ku Kurdistanî, yên ku rê û rêbazên demokratik dipejirînin û raman û têkoşîna dij-mêtingeriyê diparêzin, wek şirîkên xwe yên hevkarî û guftûgoyên xwezayî dibîne. Hebûna nexşerêyên ciyawaz û meylên îdeolojîk, li gor helwêsta me ya demokratîk, gelekî tabiî û pêwist in. Lêbelê, tu ciyawaziyeke siyasî, nabe xwe li ser mafên netewî yên hevpar yên neteweya Kurd ferz bike.

Di vê çarçoveyê de partiya me, di wê bawerî û qinyatê de ye ku nexşerêya ku di siyaseta Kurdan de bi salan hatiye parastin û çareseriya doza Kurdistanê di nava pergala dewletên mêtinger de, bi pêşxistina "yekbûna mayînde" dibîne, ji armanca dîrokî û siyasî ya doza Kurdistanê re nikare bibe bersivek. Mafên demokratîk, reformên makezagonî û bibaştirkirina îdarî, bêguman ji bo jiyana rojane ya gelê me xalên girîng in. Lê yek ji van jî nikare cihê mafê neteweya Kurd ku bibê xwediyê welatê xwe bigire. Reform dikarin awayê rêvebirinê biguherînin, lêbelê nikarin têkevin şûna serweriya neteweyî.

Li gorî helwêsta PDK-Bakur, mafê neteweya Kurd ya serweriya li welatê xwe, ne mijara bazarê ye. Lewre, serweriya neteweyî ne mafek e ku di nava sînorên tu qonaxeke siyasî de, bi guftûgo an lihevhatinên demkî bên nîqaşkirin yan pênase kirin. Ev maf, mafeke xwezayî û jêneger e ku ji hebûna neteweya me pêk hatiye. Têkoşîna partiya me jî, têkoşîna şênberkirin û lidarxistina vî mafî ye, yê ku bi serbestî û rêyên demokratîk divê bê birêvebirin.

Partiya me pê bawer e ku çareseriya doza Kurdistanê encax li ser şêwazên hiqûqa navneteweyî, mafê çarenûsî û di çarçoveya meşruîyeta demokratîk de dikare bê safîkirin. Aşîtiya mayînde û adil, encax dema ku îradeya neteweya Kurd bihête nasîn û gelê Kurdistanê çarenûsa welatê xwe, li ser zemîneke siyasî ya ku bikare bi îradeya xwe diyar bike, pêk tê.

Di 61emîn Salvegera Damezrandina partiyê de, PDK-Bakur ji raya giştî re careke din eşkere dike ku ew bi hêz û baweriya ku ji Seîd Elçîyê nemir û ji hevdozên wî ji me re wekî mîrat mane werdigire, û têkoşîna xwe bi heman dilsoziyê û baweriyê didomîne.

**Komîteya Rêveberiyê ya PDK-Bakur**